# ŞERKEFTIN

www.tevgerakomunist.com Hejmar: 07 Dîrok: Sibat 2023 DENGÊ ŞOREŞ Û AZADIYÊ

# BERXWEDANA ME TOLA ŞEHÎDAN E

# مقاومتنا انتقام للشهداء

# Komûnîstên Şoreşger Wê Di Roja îro û pêşeroja Kurdistanê de Her Tim Jiyan Bikin'

Azadiya netewa Kurd, azadiya gelên Tirk, Ereb, Fars, karker û kedkarên dewletên ku Kurdistanê di bin nîra dagirkeriyê de digirin in jî. Azadiya netewa Kurd di heman demê de azadbûna tevahî Rojhilata Navîn a ku vegeriyaye hapseke gelan e . Ji ber vê yekê destkeftinên Kurdan ên çar parçeyê Kurdistanê, artêşa bi sîleh ku ji bona vê têdikoşe, gerîlayê ku ji bona vê têdikoşe û fermandarên wê ya pêşeng di hedefa dewleta Tirk, hikûmeta Şamê û di hedefa rejîma Îranê ya Melelî de ye. Ev dewletên ku li ser gelek mijaran di nav nakokiyan de ne, li ser mêtîngehkirina Kurdistanê di nav tifaqiyê de ne.

Di têkoşîna çînî ya Kurdistanê de du qamp hene. Di aliyekî de şoreşger û komûnîstên ku ji bo Kurdistaneke azad û sosyalîst şer dikin, di aliyê din de Emerîka, Rûsya, Îran, Şam û dewleta Tirkiye heye. Îro hêza ku pêşengtiya cepheya dij şoreşê dewleta Tirk dike. Dikdatoriya faşîst a AKP-MHP dezgeha desthiladariyê ya baviksalar, kapîtalîst û mêtînger e. Taybetmendiya vê dewletê kedxwar û qirker e. Ji bo avakirina dewleta Tirk Kurd, Ermen, Suryan, Rûm hatine qetilkirin, ji welatên xwe hatine derxistin û mal û milkên wan hatiye werankirin û hatiye çopandin. Dikdatorê faşîst Erdogan niha jî ev xeta dewleta Tirk berdewam dike. Wateya dîrokî û rojaneyî ya dijminatiya dewleta Tirk a li dijî gelan, Kurdan û pêşêngên wê yên şoreşger û komûnîst ji vir tê.

Dewleta Tirk, tesfiyekirina rêxistinên Kurdan ên pêşeng dixwaze hebûna xwe ya mêtînkariyê misoger bike. Dewleta Tirk a faşîst jî dizane ku avabûna Kurdistana Azad dawiya dewleta Tirk a mêtîngar e. Ji ber vê yekê bi tevahî hêza xwe li ser du hedefên stratejîk kûr bûye. Hedefa yekemîn tesfîyekirina hêza gerîla û hedefa duyemîn jî tunekirina ji Rojava bigir heta welatê xweser ê Kurdistan û welatê Rêveberiya Xweser ê Bakur û Rojhilatê Sûrî ye. Her gaveke ku Kurd ji bo azadiyê davêjin ji bi gelê Kurd ê kedkar ên parçeyên din jî dibe çavkaniya rênîşander. Wa dewleta Tirk a mêtînger şkenandina hêviya jiyanê ya li Kurdistana azad û yekbûyî ji xwe re dike hedef. Li Tirkiye û Bakurê Kurdistanê feqîrtiya gelên me yên kedkar her ku diçe kûrtir dibe. bêkarî, qetlîqamên li ser jinê zêde dibin, jiyana xwezayî tê tunekirin. Ziman û nasnameya Kurdan tê asîmîlekirin, hebûna Kurdan tê înkarkirin. Li dijî ev rastiya mêtîngêriyê li Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûrî pergala xweser û demokratîk weke alternatîfeke gelekî xurt mezin dibe. Ji bo parçeyên Kurdistanê yên din û têkoşîna azadiya gelan dibe moşena pêşeng. Sedema êrîş li ser êrîş anîna ser çiyayên Kurdistan û Rojava ev hebûna şoreşgerî ye. Wa ev rastiyên ku dewleta Tirk, Dikdatoriya faşîst a AKP û MHP dîn û har dike bêyî hebûna partiyên pêşeng û rêber nayê avakirin. Serhildana jin û gel ku ev 5 meh e li Îranê berdewam dike ger ku nazivire desthiladariyeke şoreşger sedema vê tunebûna pêşengtiya şoreşgertî ye. Rêbertiyê şoreşger zanebûna desthiladariya şoreşger a serhildana gel e. Ji bona vê rêbertiya şoreşger her tim hedefa stratejîk a tunekirin û tesfiyekirinê ye. Weke şênber êrîşên li ser PKK'ê û MLKP'ê di vê berfirehiyê de tên kirin.

**Li Rojava Tevgera Komûnîst Çima Tê Hedefgirtin?**

Li Rojava nakokiyên neteweyî weke bingeh hatiye çaresarkirin. Nakokiyên çînî û zayendî jî hîna du pirsgêrêkên bingehîn ku li benda çaresariyê ne. Ev erk erkên bingehîn ku li pêş komûnîstan in. Di xeta welatperêziya sosyalîst de pêşxistina şoreşa Rojava rêya yekena ya çaresariya nakokiya çînî û zayendî ye. Li Tirkiye û Bakurê Kurdistanê dîrokeke gelekî xurt a şoreşger û komûnîst heye. Kok berdana vê dîrokê li Rojava elbet ji bo dewleta Tirk a mêtînger xetereyeke gelekî mezin e. Em dikarin vê rastiyê îdîa bikin ku şoreşgerên komûnîst li Rojava ji aliyê gel ve hatiye qebûlkirin û erêkirina xwe ji aliyê gel ve bidestxistin e. Êdî gîhaştiye asteke baweriyê û hêzeke polîtîk. Şoreşgerên komûnîst êdî kok berdan Rojava. Dewleta Tirk a faşîst û mêtînger dixwaze van kokan budam bike û tevgera komûnîst tune bike. Lê divê nayê ji bîrakirin ku her budam rihê darê hîna xurtir dike.

Di dîroka me ya Rojava de bi taybet hedefgirtina rêberên komûnîst ên weke Baran Serhed, Ehmed Şoreş, fermandarê ciwan Firat Newal, pêşêngên komûnîst Metîn Dîcle û Ferhat Erebo girêdayî heman hedefê ye.

Li dijî êrîşa rêheval Baran Serhed bersiva komûnîstan komkirina 1.emîn konferansa MLKP'ê bû. Li Rojava biryara di asteke hîna pêş de rêxistinkirina tevgera komûnîst di vê konferansê de hatibû girtin. Ev biryar tê wateya di asteke hîna jor de rêxistinkirina xebata polîtîk a girseyan û cepheya leşgerî ya polîtîk. Di heman demê de ev biryar tê wateya weke bîrdozî û polîtîk kûrkirina parastina şoreşê. Bi vê gavê, îsrara xeta welatperêziya sosyalîst ku bi daneheva tecrûbeyên mezin hat pêşxistin.

Yek ji rêber û parêzvanê vê biryardarî û xetê rêheval Ehmed Şoreş e. Weke rêber û fermandarekî komûnîst ku emrê xwe nezirî doza azadiya Kurdistanê û komûnîzmê kiriye ew bû damêzrênêr û têkoşerê vê xetê. Rêheval Ehmed Şoreşê ku ji 34 salên têkoşîna xwe 10 salên xwe daye parastin û avakirina şoreşa Rojava li Rojava wesfên gelekî mezin da hebûna şoreşgerên komûnîst. Weke avakerê tabûra Şehîd Serkan, Şehîd Sarya Tabûra azadiyê ya enternasyonal, ji bo pêşketina şoreşger û şervanên komûnîst erk û berpirsiyartî girt ser milên xwe.

Ji pê ve di hemleyên Şehîd Rûbar, Hol, Reqa, Minbic, Sîlûk, Girê Spî, Şedadê, Tişrîn de hem weke fermandarê şer, hem jî weke fermandarê şervanên komûnîst û tabûra enternasyonal erkên xwe bi cih aniye. Bi tevlîbûna xebatên komîn û meclîsan jî di pêvajoyên avakirina civakî ya şoreşê de erk girtiye ser milên xwe. Ew li Rojava bûye havînê kok berdana tevgera komûnîst. Weke rêheval Baran Serhed bûye rihê komûnîst a şoreşa Rojava. Bersiva herî mezin li dijî qetilkirina rêheval Ehmed, Firat, Metîn û Ferhad bi her awayî parastina mewziya şoreşa Rojava ye. Erka parastinê ya yekem destpêkê de di nav jinên ciwan, civak û tevahî gel de mezinkirina rêxistinê ye. Bi hedefa qezençkirina bi dehan kadroyên komûnîst bi seferberiyeke kedê rêxistinbûn e. Bi her çar destan xwe lê pêçandina erkan e. Divê em li dijî her cure lîstok û êrîşên dijmin vala derxin. Ji bo vê zanebûn û dsîplîneke şoreşgerî pêwîst e. Divê şiyara "Rojava welatê me ye! Em bernadin" di çalakî û parastinê de wate bi dest bixe.

Di vê pêvajoyê de talîmata nemirên me, talîmata rêheval Ehmed û Firat ji me re ev e. Ger ku talîmatek bê erka her şoreşgerek û şervanekî/ê tevgerkirina li gorî vê talîmatê ye. Hemû şervanên komûnîst divê li ser erka xwe bin. Dema ku Karl Marks şehîdên komîna Parîsê bi bîr dianî gotibû "Wê di dilê berz ê çîna karkeran de bên veşartin." Rêheval Ehmed û Firat jî îro di dilê gelên Kurdistanê û gelên bindest de ne.

# Dostê Şer ê Serkeftin û Kêfxweşiyê: Partî

**Lawazbûna mêjiya partiyê, derketina pêş ya xwestekên keseyatî ya pêşiya hevbeşiyê, reviyana ji çaresarkirina pirsgêrêkan, lawazbûna baweriya ji şoreş û sosyalîzmê, zêdebûna bêbaweriyê, kêmbûna hêviyê, nêzikatiyên tekekesîbûn û nexuyabûna xwestekan, encamên bandorên ku êrîşên îdeolojîk afirandiye. Îdeolojî, dişibe hêzeke ku dendika atomê dorpêç dike û wê bi awayekî yekbûnî digire. Dema ku ev hêz tune bibe dendik belav dibe. Sedema têkçûn û belavbûna keseyetan îdeolojîk e.**

Şer alavekî siyasetê ye. Wateya serkeftina di şer de ew e ku yek ji aliyên şer îradeya xwe bi aliyê din dide qebûlkirin. Ji dema pêkhatina civaka biçîn de heta îro têkoşînên çînî berdewam e. Çînên bingehîn ku civakê pêk tînin bi hev du re her tim di nav şer de ne. Çînên serdest, xwediyên koleyan, derebeg ji bo berdewamiya desthiladariya xwe icbarî divê îradeya xwe bi çînên bindest bidin qebûlkirin û ji bona vê sînorê tundiyê tune ye. Tiştê kevin dewsa xwe ji tiştê nû re dihêle, şertên civakî serûbin dibe û ji nû ve tê avakirin. Pêşketina burjuwaziyê dîsa di serdemeke wiha de derbas bû. Burjuwaziyê ji bona ku desthiladariya xwe ava bike bi serûbinkirina têkîliyên civakî pêş ve çû. Burjuwaziya ku li dijî bermayiyên sîstema kevin şer dike ji bo ku serkeftinê bi dest bixe mecbûr bû ku li hêza afirînerê û guherîner a çîna bindest a feodalîzmê bawer bike.

Serkeftina burjuwaziyê bi gelemperîbûna bazara kapîtalîst, têkîliyên sermiyanê berê li parzemîna Ewropayê, piştre jî li tevahî cîhanê bû serdest. Kapîtalîzmê, qeyrana xwe ya yekemîn a mezin û giştî di salên 1870'an de jiyan kir û ket pêvajoya yekdestbûnê. Teva ketina derbasbûna emperyaliyetê ya kapîtalîzmê mecbûr ku ya kevin veguherînê. Pêvajoya ku kapîtalîzm piştî sed salan dîsa ketiye heman pêvajo bû. Kapîtalîzm ji bo ku ji ev qeyrana binyadî derbikeve çaresarî di kûrewîbûnê de dît û ket nav pêvajoyeke nû ya avabûnê. Ev ji bo wê ji bo serdemekê dihat wateya redkirina têkîliyên nû. Rewşa kapîtalîzmê ya yekemîn a îptîdayî ku derket ser dîka sehneyê êdî bêveger ji ser dîka sehneyê daket û dewsa xwe ji kûrewîbûna emperyaliyetê re hişt. Îro jî burjuwazî ligel hemû derfetên xwe lezana bilindbûna we winda kiriye. Burjuwaziya ku di na bêçaresariyê de ye êdî di berdewamkirina fikra neguherîna pergalê de zehmetî dikişîne. Ji ber vê yekê êrîşa fikra "Cîhaneke din gengaz e" dike.

Burjuwazî weke çînên berî xwe li dijî çînên ku li dijî xwe serî natewîne di her rehendê de şerekî giran dide meşandin. Şoreşa 1917'an ya sowyetan ji bo çînên bindest di vî şerî de serkeftineke gelekî mezin e. Encax burjuwaziyê qada şerê ku di sala 70'an de destpêkiriye piştî hilweşîna sowyetan berfireh kir. Li cîhanê beşeke girîng ji tevgerên komûnîst li dijî ev êrîşa îdeolojîk li ber xwe nedan û belavela bûn. Xeyaleta ku bi zayîna çîna karkeran li ser cîhanê dest bi gerê kir, teva şoreşa sosyalîst a sowyetan bi hestî û goşt hat nuxumandin. Bi gîhaştina rastiyê ya sosyalîzmê di mêjiya tevahî mirovan de cih girt. Niha jî dijmin dixwaze vê rastiyê ji mêjiya mirovan sîl bike û ji bona vê tevahî alavên xwe bi kar tîne. Ew kesên ku di kursiyên akademiyên dijmin de diaxivin di bin navê nûjeniyê de nezeriya radestbûnê dikin. Ev Marksîstên postmodern bi valakirina hundirê nezeriya şoreşger, aliyê wê ya şoreşger qut dikin û davêjin. Ev nezerîvanên nû, nezeriya şoreşger ji bo burjuwaziyê tînin rewşeke ku bêqebûlkirin. Li her derê nebaşiya kapîtalîzmê nîqaş dikin lê sosyalîzma ku piştî kapîtalîzmê yekemîn gava rizgarbûnê ye înkar dikin. Bi vî awayî dixwazin ku her cure hêviya rizgarbûna ji sosyalîzmê tune bikin. Bêbaweriya tecrûbe û agahiyên dîrokê rêxistin dikin. Ev ji bo keseyatekî ku xwedî nêrîna cîhanê ya materyalîzma dîyalektîk e nêzikatiyeke aks e. Encax hewldanên rêxistinkirina bêbaweriya li dijî şoreş û sosyalîzmê di nav komûnîstan de jî bandora xwe nîşan dide.

Cihê ku Agahî û tecrûbeyên ku di dîrokê de kom bûye partiyê komûnîst e. Ji ber vê yekê partiyê komûnîst ji bo têkoşîna ku di oxira sosyalîzmê de hatiye dayin jêveneger e. kapîtalîzmê hêza serûbinkirinê ya afirînerê û veguhêrîner a kolektîvîzmê (hevbeşiyê) yekîtiyê û rêxistinbûnê di sala 1917'an de tecrûbe kir. Niha jî kapîtalîzm ji bo ku ev serkeftin dubara nebe qasî ku ji destê xwe derdikeve êrîşa fikra rêxistinê dike. Mirovan tenê dihêle û ferdîdiyê derdixe pêş.

Mirov jî her ku tenê dimîne derfetên redkirin, berxwedan û serî netewandinê winda dike. Heta ku mirov tenê bi serhildanên xwe sînordar bimîne û tiştên ku tên redkirin mirov nebe tevgerkirina bi kesayetên din re ev yek ji bo pergalê ne xetere ye. "Li dijî ji bo nefsa tiştên ku hûn bi hev re serî hil didin, ji bo nefsa rewşên ku hûn bi hev re red dikin ji mêjiya xwe derxin. Ji ber ku tiştên ku hûn weke rêxistin bi nav dikin di dîrokê de ma, têk çû û wê kapîtalîzm derfetên hîna baştir bide we." Ji mirovan tê xwestin ku ûsa bifikirin. Bila nayê hesibandin ku ev fikir bandor li şoreşgeran nake. Têkîliyên sermiyanê yên serdema kûrewîbûna emperyaliyetê bi her awayî bandor li mirovan û têkîliyên navbera mirovan dike û bila nayê ji bîrakirin ku her kesayetek ji nav van têkîliyan derdikeve û tê.

Kesên ku tenêbûna xwe bi redkirina hinek tiştan û serhildanê şirove dikin, ji bo ku xwe hîna baştir hês bikin vê dikin. Encax rastiya xwe înkar dikin û êdî tevahî xwesteka xwe ya li dijî van tiştan sekinînê winda kirine. Her ku mirov tenê dimîne, tirsa serneketin û têkçûnê mirov dorpêç dike. Êdî îradeya kesê ku dikeve nava vê hestê tune ye û ew dibe kole. Mirov carekê tenê bimîne ger mudaxeleyek ji derve nebe ew ji wê tenêbûnê nikare rizgar bibe. Xwesteka mirovekî ya tenêbûnê, ji ber derxistina pêş ya kesayetîbûnê ye. Ji ber vê yekê ye ku tenêbûn, ji mirovê serdema kapîtalîzma ku her tiştî di tenêbûnê de dibîne re balkêş tê. Derxistina pêş ya şexsîbûnê (tekekesî) dûrketina ji civakîbûnê ye. Bi zanebûn çêtir dîtina vê yekê, reviyane ji rastiyê ye. Redkirin, serî netewandin, berxwedan, têkoşînkirina û li dij sekinîna van tiştan bedel dayin pêwîst dike. Encax heta ku mirov tenê bi serê xwe ye, barê vê bedelê nikare rake û di bin wî barî de winda dibe. Rêxistin jî rakirina vî barî hêsan dike. Ji ber ku li vir mirovên ku mil daye hev hene û ev mirov alîkariya we ya sekînina li ser lingan dike. Astengiyên ku di ev rêya kolik de derdikevin encax bi mêjiya hevbeş û rêxistina ku bi îradeya hevbeş bicisim dibe tên derbaskirin.

Lawazbûna mêjiya partiyê, derketina pêş ya xwestekên keseyatî ya pêşiya hevbeşiyê, reviyana ji çaresarkirina pirsgêrêkan, lawazbûna baweriya ji şoreş û sosyalîzmê, zêdebûna bêbaweriyê, kêmbûna hêviyê, nêzikatiyên tekekesîbûn û nexuyabûna xwestekan, encamên bandorên ku êrîşên îdeolojîk afirandiye. Îdeolojî, dişibe hêzeke ku dendika atomê dorpêç dike û wê bi awayekî yekbûnî digire. Dema ku ev hêz tune bibe dendik belav dibe. Sedema têkçûn û belavbûna keseyetan îdeolojîk e. îro bawernekirina guherîna mirovan, bawernekirina ji hêza mirovan a afirîner û bawernekirina hêza girseyan bûye nêzikatiyeke giştî. Têkoşînkirina li dijî van nêzikatiyan erka her şoreşgerekî ye. Ger ku li meyldariya êrîşên îdeolojîk bê mêzekirin tê dîtin ku ramana rêxistinê hedefa bingehîn e. Şoreşgertî terikandina bermayiyên eydî çanda kevin û nûbûyîn e. Tenê cihê ku ev rastî pêk were û berdewamiya wê bê parastin rêxistin e. Rêxistin cihê ku tevahî nirxên me yên manewî tê de kom dibe ye. Nirxên manewî di têkoşîna azadiyê de yek ji hêmanên herî girîng e. Nirxên manewî yekîtiya tevahî hêzê xurt dikin û rê nîşan didin. Nirxên manewî yek yek bandor li îradeya kesayetan dike û bi keseyatan re dibin yek. Dijmin bi êrîşkirina nirxên me yên manewî dixwaze ramana rêxistinê ji hişan sîl bike.

Lewma mezinkirina mêjiya rêxistin û bi tevahî hêza xwe piştgirî dayina mêjiya rêxistinê berpirsiyartiya her şoreşgerekî ye. Rêxistin yekîtiyeke çalakiyê ye. Encax bêyî armanceke hevbeş yekîtiya çalakiyê bêderfet e. Lewma divê bi awayekî rastinî nîqaşkirin û têgîhiştina armancê û bi vî awayî hevbeşîbûn bê rêxistinkirin. Rêxistin di heman demê de civata mirovên ku bi armanç û baweriya xwe yekbûyî ye. Yanê li vir yek armanç heye. Ev armanç şoreşa sosyalîst e. Şertê vê ya mecbûrî bidestxistina desthiladariyê ya çîna karkeran e. Ya ku vê pêk bîne jî proleterya û serkanê wê ya şer e. Heta ku dîrokeke me ya ku em lê xwedî derkevin û pêşerojeke me ya ku em xeyal bikin hebe, em ê tevahî astengiyên ku di rêya sosyalîzmê de derkevin pêş me derbas bikin û em ê serbikevin. Weke ku Brecht nivîsandiye "Em carekê dest bi kar bikin / em bi tevahî hêza xwe şer bikin / kêfxweşî fetihandin / xwe bi xwe nayê."

# EHMED ŞOREŞ Û FIRAT NEWAL BI MERASÎMEKÎ GİRSEYÎ HATIN OXIRKIRIN

Endamê Komîteya Partiya Marksîst Lenînîst Komûnîst (MLKP) û Endamê Rêxistina MLKP'ê ya Kurdistanê, nûnerê MLKP'ê yê Rojava Ehmed Şoreş (Zeki Gürbüz) û yek ji fermandarên MLKP'ê Firat Newal (Özgür Namoğlu) li Hesekê bi merasîmekî girseyî hatin oxirkirin. Ehmed Şoreş û Firat Newal di dîroka 3'ê meha çileya 2023'an de bi hevkariya Emerîka ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve bi êrîşeke hewayî hatin şehîdxistin.

Merasîma ku bi sedan kes û nûnerên saziyan û hêzên leşgerî tevlîbûn bi torena leşgerî dest pê kir û bi rêzgirtinê berdewam kir. Di merasîmê piştî axaftina Meclîsa Saziya Şehîdan li ser navê Meclîsa Leşgerî ya QSD'ê axaftineke hat kirin. Nûnerê QSD'ê di axaftina xwe de got "Me bi 4-5 hevalan dest bi vê têkoşînê kir, em ji dehan kesan gîhaştin hezaran, deh hezaran, îro em bi sed hezaran û mîlyonan in. Êdî kes nikare bi tanq û topan vîna me bişkîne, têkoşîna me berdewam e."

**Asya: Em Her Yek Ehmed Şoreş in, Baran Serhed in, Firat Newal in**

Piştî Meclîsa Leşgerî Bêrîtan Asya axivî û di axaftina xwe de soza mezinkirina şoreşê û rakirina tola tevahî şehîdan da. Asya di axaftina xwe wiha berdewam kir "Rêheval Ehmed Şoreş ji emrê xwe yê 57 salan 34 salên xwe nezirî şoreşa Tirkiye, Kurdistan û Rojhilata Navîn kir. Dema ku şoreşa

Rojava destpê kir ji tevahî cîhanê, Tirkiye û Kurdistanê bi sedan şervanan berê xwe dan şoreşê. Ev bi pêşengtî û rêbertiya rêheval Ehmed bû. Di sala 2019'an de dijmin bi qetilkirina rêheval Baran xwest ku vîna me bişkîne. Ala rêheval Baran berê rêheval Ehmed rakir. Rêheval Ehmed ji hamleya şehîd Rûbar heta Reqa ji Sîlûk heta Tişrîn, ji Şedadê heta Minbiç di tevahî hamleyên rizgarkirina Rojava de hem weke fermanderekî sor, hem jî weke şervan cih girt û di têkoşîna li dijî DAÎŞ'ê roleke mezin lîst. Bila dost û dijminên me baş bizanibin ku yek ji me bimîne jî em her yek heta dawiya dilopa xwîna xwe Ehmed Şoreş in, Baran Serhed in, Firat Newal in." Asya anî ser ziman ku dema ku herkesî berê xwe dida Ewropayê rêheval Firat ji Ewropayê berê xwe daye çiyayên azad û şoreşa Rojava. Ew weke stêrkeka sor û fermanderekî ciwan bû sembol.

**Porê: Em ê Heta Serkeftinê Têkoşîna Xwe Bilind Bikin**

Di merasîmê de li ser navê koordinasyona TKŞ Xalid Porê axivî. Porê di axaftina xwe de anî ser ziman ku ji Tirkiye heta Bakur, çiyayên azad û Rojava pêşengtî ji têkoşînê re kiriye. Porê axaftina xwe wiha berdewam kir "Hewldana dewleta Tirk ew e dixwaze statûya gelê Kurd asteng bike. Dîroka dewleta li ser tunekirina Kurdan hatiye avakirin. Em ji hêzên dewleta Tirk a tarî re dibêjin ku hûn tu carî nikarin vîna gelê me bişkînin. Em ê bi rihê rêheval Ehmed û Firat heta serkeftinê têkoşîna xwe bilind bikin." Piştî axaftinan mesajên malbata Ehmed Şoreş, Firat Newal û mesajên rêxistinên şoreşger ên Tirkiye, Kurdistan û cîhanê hatin xwendin.

Piştî xwendina mesajan vesîqayên şehadetê hatin xwendin. Di merasîmê de ji denga Ehmed Şoreş stran hatin guhdarkirin. Ehmed Şoreş û Firat Newal bi dirûşmeyên "Şehîd Namirin" , "Femandarê Sor Nemir e" , Stêrka Sor Nemir e" , "Dîsa Dîsa Serhildan MLKP Kurdistan" hatin spartin axê. Piştî spartina axê komûnîstan li ser gora şehîdan sonda şoreşê xwendin.

# الشيوعيون الثوريون اليوم وفي المستقبل عش للأبد في كردستان

حرية الأمة الكردية وحرية الشعب التركي والعربي والفارسي وعمال الدول التي تضع كردستان تحت نير الاحتلال. حرية الأمة الكردية هي أيضاً حرية الشرق الأوسط بأكمله ، الذي عاد إلى سجن الشعوب. لذلك فإن إنجازات الأكراد في مناطق كردستان الأربعة ، والجيش الذي يقاتل من أجل ذلك ، والمسلحين الذين يقاتلون من أجل ذلك وقادته هم هدف الدولة التركية وحكومة دمشق ونظام الملالي الإيراني. هذه الدول المتنازعة حول العديد من القضايا هي في تحالف حول مركزية كردستان. هناك معسكرين في الصراع الطبقي في كردستان. من جهة هناك ثوار وشيوعيون يقاتلون من أجل كردستان حرة واشتراكية ، ومن جهة أخرى أمريكا وروسيا وإيران ودمشق ودولة تركيا. اليوم ، هي القوة التي تقود الجبهة المناهضة للثورة في الدولة التركية. إن الديكتاتورية الفاشية لحزب العدالة والتنمية وحزب الحركة القومية هي دكتاتورية أبوية ورأسمالية وظالمة. إن خاصية هذه الحالة شاقة ومدمرة. لبناء الدولة التركية قتل الأكراد والأرمن والسوريون والرومانيون وطردوا من بلادهم ودمرت ممتلكاتهم ودمرت. يواصل الدكتاتور الفاشي أردوغان هذا الخط من الدولة التركية. من هنا يأتي المعنى التاريخي واليومي لعداء الدولة التركية ضد الشعب والأكراد وقادتها الثوريين والشيوعيين.

تريد الدولة التركية الفاشية القضاء على المنظمات الكردية الرائدة لضمان وجودها. كما تعلم الدولة التركية الفاشية أن إقامة كردستان الحرة هي نهاية الدولة التركية. لذلك ركزت قوتها الكاملة على هدفين استراتيجيين. الهدف الأول هو تصفية قوات حرب العصابات والهدف الثاني تدمير من روجافا إلى دولة كردستان المتمتعة بالحكم الذاتي ودولة الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا. كل خطوة يتخذها الأكراد من أجل الحرية تصبح مصدر إرشاد للشعب الكردي المجتهد في الأجزاء الأخرى. تهدف الدولة التركية القمعية إلى تدمير أمل الحياة في كردستان حرة وموحدة. في تركيا وشمال كردستان ، يزداد فقر شعبنا عمقًا وأعمق. البطالة ، قتل النساء آخذ في الازدياد ، والحياة الطبيعية تتدمر. يتم استيعاب لغة وهوية الأكراد ، ويتم إنكار وجود الأكراد. في مواجهة واقع القمع في غرب وشمال وشرق سوريا ، ينمو النظام المستقل والديمقراطي كبديل قوي للغاية. أصبحت حركة رائدة لأجزاء أخرى من كردستان ونضال الشعب من أجل الحرية. سبب الهجوم على جبال كردستان وروج آفا هو هذا الوجود الثوري. هذه الحقائق التي تجعل الدولة التركية ، الديكتاتورية الفاشية لحزب العدالة والتنمية وحزب الحركة القومية ، غاضبة وغاضبة ، لا يمكن إثباتها دون وجود أحزاب قيادية وقيادية. إن انتفاضة النساء والشعب المستمرة منذ ٥ أشهر في إيران ، إذا لم تتحول إلى حكومة ثورية ، هي سبب هذا النقص في القيادة الثورية. القيادة الثورية هي معرفة السلطة الثورية لانتفاضة الشعب. بالنسبة لهذه القيادة الثورية ، فإن الهدف الاستراتيجي دائمًا هو التدمير والتصفية. على سبيل المثال ، يتم تنفيذ الهجمات على حزب العمال الكردستاني وحزب الشيوعي الماركسي اللينيني في هذه المنطقة.

لماذا الحركة الشيوعية مستهدفة في روج افا؟ في روجافا ، تم حل النزاعات الوطنية كأساس. لا تزال النزاعات الطبقية والجندرية قضيتين أساسيتين تنتظران الحل. هذه الواجبات هي الواجبات الأساسية أمام الشيوعيين. إن تطور ثورة روج آفا في خط الوطنية الاشتراكية هو السبيل الوحيد لحل الصراع الطبقي والجنساني. هناك تاريخ ثوري وشيوعي قوي للغاية في تركيا وشمال كردستان. إن إطلاق جذور هذا التاريخ في روج آفا يشكل بالطبع خطرًا كبيرًا جدًا على الدولة التركية القمعية. يمكننا أن ندعي حقيقة أن الثوار الشيوعيين في روج آفا قد تم قبولهم من قبل الشعب وفازوا بموافقتهم. لقد وصلت الآن إلى مستوى من الثقة والسلطة السياسية. لقد ترسخ الثوار الشيوعيون الآن في روج آفا. فالدولة التركية الفاشية والقمعية تريد تدمير هذه الجذور وتدمير الحركة الشيوعية. لكن لا ينبغي أن ننسى أن كل تقليم يجعل جذر الشجرة أقوى. في تاريخ روج آفا ، فإن استهداف القادة الشيوعيين مثل باران سرحد وأحمد شورش القائد الشاب فرات نوال والزعماء الشيوعيين متين دجلة وفرهاد عربو مرتبط بنفس الهدف. كان رد الشيوعيين على هجوم الرفيق باران سرحد هو تنظيم المؤتمر الأول لحزب الشيوعي الماركسي اللينيني. في روجافا ، تم اتخاذ قرار تنظيم الحركة الشيوعية على مستوى آخر في هذا المؤتمر. يعني هذا القرار تنظيم العمل السياسي للجماهير والجبهة السياسية العسكرية على مستوى أعلى. في الوقت نفسه ، يعني هذا القرار تعميقًا أيديولوجيًا وسياسيًا للدفاع عن الثورة. بهذه الخطوة ، تم تطوير إصرار خط الوطنية الاشتراكية مع بيانات الخبرة الكبيرة. أحد القادة والمدافعين عن هذا التصميم والخط هو الرفيق أحمد شورش. كقائد شيوعي وقائد حارب من أجل حرية كردستان والشيوعية ، أصبح مؤسس هذا الخط ومقاتله.

الرفيق أحمد شورش ، الذي أمضى ١٠ سنوات من نضاله البالغ ٣٤ عامًا من أجل حماية وبناء ثورة روج آفا في روج آفا ، أشاد كثيرًا بوجود الثوار الشيوعيين. بصفته مؤسس كتيبة الشهيد سركان ، تولى شهيد سارية مسؤولية تطوير الثوار والمقاتلين الشيوعيين. ومنذ ذلك الحين ، أدى مهامه كقائد حرب وقائد للمقاتل الشيوعي والكتيبة الدولية في عمليات الشهيد روبار ، هول ، الرقة ، منبج ، سلوك ، كري سبي ، الشدادي تشرين. من خلال المشاركة في أنشطة الكومينات والمجالس ، تولى المسؤولية في عملية البناء الاجتماعي للثورة. لقد أصبح أصل الحركة الشيوعية في روج آفا. مثل الرفيق باران سرحد ، أصبح العصب الشيوعي لثورة روج آفا.

الرد الأكبر على مقتل الرفاق أحمد وفرات ومتين وفرهاد هو الدفاع عن موقف ثورة روج آفا بأي شكل من الأشكال. واجب الدفاع الأول هو رفع مستوى التنظيم بين الشابات والمجتمع والشعب بأسره. وهي منظمة هدفها اكتساب عشرات الكوادر الشيوعية من خلال التعبئة العمالية. من واجب أن تغطي نفسها بأيدي الأربعة. علينا الدفاع ضد جميع أنواع الألعاب وهجمات الأعداء. المعرفة والانضباط الثوريان ضروريان لهذا الغرض. "روج افا بلدنا!" لن نستسلم "لاكتساب معنى في العمل والحماية. في هذه العملية ، هذه هي تعليمات الخالدين لدينا ، تعليمات الرفاق أحمد وفرات. إذا كانت هناك تعليمات ، فمن واجب كل ثوري ومناضل العمل وفقًا لهذه التعليمات. يجب أن يكون جميع المقاتلين الشيوعيين في الخدمة. عندما تذكر كارل ماركس شهداء كومين باريس ، قال: "سوف يُدفنون في قلب الطبقة العاملة النبيل". الرفيقان احمد وفرات ايضا في قلوب شعب كردستان والشعب المظلوم.

# صديق المعركة من النجاح والسعادة الحزب و ضعف عقل الحزب ،

ظهور الرغبات الفردية قبل القواسم المشتركة ، الهروب من حل المشكلات ، إضعاف الإيمان بالثورة والاشتراكية ، تنامي انعدام الثقة ، انعدام الأمل ، قرب النزعة الفردية وغياب الرؤية. الرغبات ، هي نتائج الآثار التي خلقتها الهجمات الأيديولوجية. الأيديولوجيا مثل القوة التي تحيط بكثافة الذرة وتبقيها متماسكة. عندما تغيب هذه القوة ، تتبدد الكثافة. سبب فشل الأفراد وتشتتهم أيديولوجي. الحرب هي أداة للسياسة. معنى الانتصار في الحرب أن أحد طرفي الحرب يعطي إرادته للطرف الآخر. منذ تشكيل المجتمع الصغير حتى اليوم ، يستمر الصراع الطبقي. دائمًا ما تكون الطبقات الأساسية التي يتكون منها المجتمع في حالة حرب مع بعضها البعض. يجب على الطبقة الحاكمة ومالكي العبيد والمضطهدين قبول إرادتهم مع الطبقات التابعة من أجل مواصلة حكمهم ، ولهذا لا يوجد حد للعنف. القديم يفسح المجال للظروف الاجتماعية الجديدة ، تنقلب ويعاد بناؤها. حدث تطور البرجوازية مرة أخرى في مثل هذه الفترة. تقدمت البرجوازية بقلب العلاقات الاجتماعية من أجل ترسيخ قوتها. كان على البرجوازية التي تقاتل ضد بقايا النظام القديم أن تؤمن بالقوة الخلاقة والتغييرية للطبقة الدنيا الإقطاعية من أجل تحقيق النجاح.

سيطر نجاح البرجوازية مع تعميم السوق الرأسمالية ، علاقات رأس المال في البداية على قارة أوروبا ، ثم العالم بأسره. مرت الرأسمالية بأول أزمة كبيرة وعامة في سبعينيات القرن التاسع عشر ودخلت في عملية الاحتكار. يجب أن يغير الانتقال الكامل للإمبريالية إلى الرأسمالية القديمة. كانت نفس العملية التي دخلت فيها الرأسمالية مرة أخرى بعد مائة عام. من أجل الخروج من هذه الأزمة الأساسية ، وجدت الرأسمالية حلاً في التعمق ودخلت في عملية تشكيل جديدة. بالنسبة لها ، كان هذا يعني رفض العلاقات الجديدة لفترة من الزمن. إن الحالة الطبيعية الأولى للرأسمالية التي ظهرت على المسرح قد تراجعت الآن بشكل لا رجعة فيه عن المسرح واستبدلت بتعميق الإمبريالية. حتى اليوم ، فقدت البرجوازية بكل فرصها زخم صعودك. إن البرجوازية ، التي هي في حالة من التردد ، تجد الآن صعوبة في الاستمرار في فكرة عدم تغيير النظام. هذا هو السبب وراء مهاجمة فكرة "عالم آخر ممكن".

إن البرجوازية ، مثل الطبقات التي سبقتها ، تشن حربا جادة ضد الطبقات التي لا تصمد ضدها. كانت الثورة السوفيتية عام ١٩١٧ انتصاراً عظيماً للطبقات المضطهدة في هذه الحرب. وسعت البرجوازية ميدان الحرب الذي بدأ في السبعينيات بعد انهيار الاتحاد السوفيتي. جزء مهم من الحركات الشيوعية في العالم لم يقاوم هذا الهجوم الأيديولوجي وانتشاره. كان الخيال الذي بدأ يسافر حول العالم مع ولادة الطبقة العاملة ، الثورة الاشتراكية بأكملها للسوفييت مغطاة بالعظام واللحم. مع إدراك حقيقة الاشتراكية ، حدث ذلك في أذهان جميع الناس. حتى الآن ، يريد العدو إخفاء هذه الحقيقة عن أذهان الناس ويستخدم كل أدواته لهذا الغرض. من يتكلم على كرسي اكاديميات العدو يتظاهر بالاستسلام تحت مسمى الابتكار. هؤلاء الماركسيون ما بعد الحداثيين ، بإفراغهم للنظرية الثورية ، قطعوا جانبها الثوري ونبذوها. يضع هؤلاء المراقبون الجدد النظرية الثورية للبرجوازية في وضع غير مقبول. في كل مكان يناقشون سوء الرأسمالية ، لكنهم ينكرون الاشتراكية التي هي الخطوة الأولى للتحرر بعد الرأسمالية. بهذه الطريقة يريدون تدمير أي أمل في التحرر من الاشتراكية. ينظم عدم الموثوقية الخبرة والمعلومات التاريخية. هذا هو النهج المعاكس لشخص لديه نظرة عالمية للمادية الديالكتيكية. تظهر الجهود المبذولة لتنظيم عدم الثقة ضد الثورة والاشتراكية بين الشيوعيين تأثيرها. الحزب الشيوعي هو المكان الذي جمعت فيه المعلومات والخبرة في التاريخ. هذا هو السبب في أن الحزب الشيوعي مسؤول عن النضال الذي حدث في نهاية الاشتراكية. شهدت الرأسمالية القوة الإبداعية والتحويلية للجماعة والوحدة والتنظيم في عام ١٩١٧. حتى الآن ، تهاجم الرأسمالية فكرة التنظيم بقدر ما تستطيع لمنع هذا النجاح من الحدوث مرة أخرى. إنه يترك الناس بمفردهم ويبرز الفردية.

عندما يُترك الإنسان بمفرده ، فإنه يفقد فرصة الرفض والمقاومة والعصيان. ما دام الناس محصورين في ثوراتهم والأشياء المرفوضة ليست بشرًا ، فهذا لا يشكل تهديدًا للنظام. "أبعدوا من عقلك الأشياء التي تقاومونها معًا ، المواقف التي ترفضونها معًا. لأن ما تسميه منظمة قد سقط في التاريخ ، وفشل ، وستمنحك الرأسمالية فرصًا أفضل ". يطلب من الناس أن يفكروا بذلك. لا ينبغي اعتبار أن هذه الفكرة لا تؤثر على الثوار. تؤثر علاقات رأس المال في عصر الإمبريالية بكل الطرق على الناس والعلاقات بين الناس ، ولا ننسى أن كل فرد يأتي ويذهب من هذه العلاقات.

الأشخاص الذين يفسرون وحدتهم من خلال رفض أشياء معينة والتمرد يفعلون ذلك ليجعلوا أنفسهم يشعرون بتحسن. إنهم ينكرون حقيقتهم والآن فقدوا كل رغبتهم في الوقوف ضد هذه الأشياء. طالما كان الشخص وحيدًا ، فإن الخوف من الفشل يحيط به. الشخص الذي يقع في هذا الشعور ليس لديه إرادة بعد الآن ويصبح عبداً. بمجرد أن يكون الشخص بمفرده ، إذا لم يكن هناك تدخل خارجي ، فلا يمكنه الهروب من تلك الوحدة. رغبة الشخص في أن يكون بمفرده ترجع إلى تعزيز الفردية. هذا هو السبب في أن كونك وحيدًا أمر جذاب لشخص العصر الرأسمالي الذي يرى كل شيء في كونه وحيدًا. تعزيز الفردية هو تجنب الاجتماعية. معرفة أفضل من هذا هو الهروب من الواقع. الرفض والعصيان والمقاومة والنضال والمقاومة لهذه الأشياء تتطلب دفع الثمن. وطالما كان الشخص وحيدًا ، فلن يتحمل عبء هذا السعر ويختفي تحت هذا العبء. كما تسهل المنظمة إزالة هذا العبء. لأنه يوجد هنا أشخاص قدموا لك يد المساعدة وهذا الشخص يساعدك على الوقوف على قدميك. لا يمكن التغلب على العوائق التي تنشأ في مسار المغص هذا إلا من خلال الدماغ المشترك والتنظيم الذي يلبي الإرادة المشتركة.

ضعف عقل الحزب ، ظهور الرغبات الفردية قبل القواسم المشتركة ، الهروب من حل المشكلات ، إضعاف الإيمان بالثورة والاشتراكية ، تنامي انعدام الثقة ، انعدام الأمل ، قرب النزعة الفردية وغياب الرؤية. الرغبات ، هي نتائج الآثار التي خلقتها الهجمات الأيديولوجية. الأيديولوجيا مثل القوة التي تحيط بكثافة الذرة وتبقيها متماسكة. عندما تغيب هذه القوة ، تتبدد الكثافة. سبب فشل الأفراد وتشتتهم أيديولوجي. اليوم ، أصبح عدم الإيمان بالتغيير البشري ، وعدم الإيمان بالقوة الإبداعية للناس ، وعدم الإيمان بسلطة الجماهير ، نهجًا عامًا. محاربة هذه المواقف واجب على كل ثوري. إذا نظرنا إلى نزعة الهجمات الأيديولوجية ، يمكن ملاحظة أن فكرة التنظيم هي الهدف الرئيسي. الثورة تخلي عن بقايا الثقافة القديمة وانبعاث جديد. المكان الوحيد الذي يمكن فيه تحقيق هذا الواقع والحفاظ على استمراريته هو المنظمة. المنظمة هي المكان الذي تتجمع فيه كل قيمنا الروحية. القيم الروحية هي أحد أهم العناصر في النضال من أجل الحرية. القيم الروحية تقوي وحدة القوة كلها وتظهر الطريق. تؤثر القيم الأخلاقية على إرادة الأفراد وتصبح واحدة مع الأفراد. يريد العدو تدمير فكرة المنظمة من خلال مهاجمة قيمنا الأخلاقية.

لذلك ، فإن رفع عقل المنظمة ودعم عقل المنظمة بكل قوة هو مسؤولية كل ثوري. التنظيم هو وحدة العمل. بدون هدف مشترك ، تكون وحدة العمل مستحيلة. لذلك ، يجب تنظيمه بطريقة حقيقية لمناقشة وفهم الهدف وللتوحيد بهذه الطريقة. المنظمة هي أيضًا مجتمع من الأشخاص الذين توحدهم أهدافهم ومعتقداتهم. هناك هدف واحد هنا. هذا الهدف هو الثورة الاشتراكية. الشرط الضروري لذلك هو تمكين الطبقة العاملة. إن البروليتاريا وقادتها الحربيين هم الذين سيفعلون ذلك. طالما لدينا تاريخ نعتني به ومستقبل نحلم به ، سنتغلب على جميع العقبات في طريق الاشتراكية وسننتصر. كما كتب بريخت "لنبدأ العمل مرة واحدة / لنقاتل بكل قوتنا / السعادة هي الفوز / لا يأتي من تلقاء نفسه."

# رفاقنا القائد الشيوعي زكي كوربوز (أحمد شورش) والقيادي أوزكور نام أوغلو (فرات نوال) خالدين الرؤساء في الاعلى الرؤساء في الاعلى

قتل نظام الإنكار الفاشي بدعم من الإمبريالية الأمريكية رفاقنا ، عضو اللجنة المركزية وعضو المنظمة الكردستانية زكي كوربوز (أحمد شورش) والقيادي الشاب أوزكور نام اوغلو. إن نضالنا من أجل الحرية والاشتراكية مستمر وسيستمر في كل مكان. ردنا على العدو الفاشي والظالم ، على طيب أردوغان وعصاباته الفاشية والعنصرية. الذين دموا بكل كيانهم ، لن تتمكن من إيقاف حزبنا وثوارنا وشعبنا. أعلام الحرب لن تسقط ، وأنابيب الحرية لن تتوقف. سوف تزدهر الدفيئة باران سرحد مرارًا وتكرارًا. لن تأخذ نتائج هتلر وموسوليني الأخوة والأخوات

وُلد زكي كوربوز ، المعروف باسم أحمد شورش في روج آفا وفي أنحاء مختلفة من العالم ، والمعروف باسم تولهلدان أكري ، في ٢٠ يناير ١٩٦٦ في بلدة برتيك التابعة لديرسم. درس المدرسة الابتدائية في قرية بستان التحتاني والمدرسة الثانوية ودرس البكالوريا في بلدة برتيك. بعد ذلك توجه إلى المؤسسة التعليمية في ديار بكر. بعد ذلك انتقل إلى مدينة اسطنبول حيث تابع دراسته في العيادة البيطرية. عرف الرفيق أحمد شورش (زكي كوربوز) الأفكار الثورية في طفولته. في المقال الذي كتبه للحزب ، قال "حقيقة البلد الذي ولدت فيه ، حقيقة الناس هيأت ثورتي". بدأ في قراءة المجلات والكتب المنشورات في تلك السنوات. شارك في الحفلات والندوات. بعد ثورة ١٢ سبتمبر ، بصفته شابًا ثوريًا غير ، انضم إلى المسيرة الطلابية الكبرى للشبيبة التي اندلعت في أبريل ١٩٨٧. بعد ذلك شارك في جميع المسيرات والفعاليات وشارك في الفعاليات التي استهدفت الأول من مايو بمنطقة تقسيم. في تاريخ ١٩٨٩ بدأ حربه الثورية في منظمة الشباب التابعة للمنظمات السابقة للحزب. خارج الجامعات عمل في المدن والضواحي. في عام ١٩٩٢ التحق بمؤتمر منظمة الشباب كمندوب (ممثل) وانتخب عضوا في اللجنة المركزية. في نفس العام ، تم اعتقاله وقضى ١٥ يومًا في تعذيب شديد للغاية ، وخرج من هذا التعذيب ورأسه مرفوع. في ١٠ سبتمبر ١٩٩٤ ، بعد ثورة الوحدة التي نجحت في عمل الحزب ، تولى المسؤولية. في نهاية عام ١٩٩٥ ، في مدينة هاتاي ، في لجنة المدينة ، حتى عام ١٩٩٨ في لجنة إزمير ، حتى يوليو ١٩٩٩ في منطقة جوكوروفا ، حتى صيف ٢٠٠٠ في لجنة اسطنبول. في الوقت نفسه ، من عام ١٩٧٧ حتى المؤتمر الثالث ، عمل كعضو في اللجنة المركزية لحزب MLKP.

عام ثوري. بقرار مشترك ، بعد المؤتمر الثالث خارج اللجنة المركزية ، تم تنفيذ مهام خاصة لقيادة الحزب. في عام ٢٠٠٦ ، عندما واجه حزبنا هجومًا خطيرًا في شهر سبتمبر ، تولى مسؤولية كونه عضوًا في اللجنة المركزية. من عام ٢٠٠٧ إلى المؤتمر الرابع ، كان أيضًا من بين منظمي

المؤتمر الرابع. من ذلك الوقت حتى عام ٢٠١٢ ، شغل منصب سكرتير اللجنة المركزية في عام ٢٠١٠ ، قاد مناطق حماية الدفاع المشروع للحزب وكان أحد مؤسسي أكاديمية حسين ديميرجي أوغلو. في نهاية عام ٢٠١١ ، عبر الحدود بساق مكسورة واستأنف عمله في اسطنبول. بعد فترة من العمل القسري والحياة في السجن في ألمانيا ، دخل روجافا في سبتمبر ٢٠١٣.كقائد شيوعي ووطني اشتراكي ، حارب بحماس وشجاعة لسنوات عديدة من أجل انتصار ثورة روج آفا وحمايتها. كرم ٣٤ عامًا من ٥٧ عامًا ثوريًا. الرفيق تولهلدان أكري ، الذي

وضع حياة قرنين من الزمان إلى ٣٤ عامًا ، من عمل الطلاب الشباب إلى عمل الطبقة العاملة وفقراء المدن ، ومن عمل العبء إلى الواجبات التأسيسية الخاصة. مهامه ، من التدريب العسكري في جبال تركيا ، إلى الإعداد للحرب في جبال كردستان وأثناء ثورة روج آفا ، كان عضوا في اللجنة المركزية لحزب MLKP وعضو في منظمة كردستان. بصفته أفضل ممثل للجيل الناجح ، كان قائد الخطوات المتقدمة في جميع المنظمات والمجالات التي عمل فيها ، وكان هو إرادة أصعب القرارات ، وأصبح قائدًا لأصعب المسيرات ، وأصبح قائدًا لأصعب المسيرات. ممثل التفاؤل الذي أودع الفرص الثورية والأمل. ربط الهدف

والشهداء ، وتحقيق أحلامهم ، كان نجم الرفيق تولهلدان أكري. وببساطة تامة (وضوح) أصبح ممثلاً لوحدة الوعد والعمل. لقد كان شيوعيًا لديه القدرة على خلق أحلام كبيرة. لم يتعرف على أي عقبات. حارب ضد الفاشية والإنكار والنظام الأبوي والرأسمالية والإمبريالية. سنجعل من ذاكرته وعدًا بمعارك أكبر وانتصارات عظيمة. سنحقق دائمًا قوة أحلامه وشجاعته وقيادته

أيها والإخوة والاخوات

ولد أوزكور نام اوغلو ، دفاعًا عن ثورة روج آفا والأكاديمية الحزبية ، فرات نوال ، باسم الرفيق الحزبي أوزان كوتلار في ١٥ يونيو

١٩٩٤ ، وهو ابن لأم ثورية وأب في مدينة إزمير. حتى بدأ الدراسة ، شارك ظروف حياته السرية مع والدته وأبيه وأصدقائه. أمضى سنوات دراسته. في سن مبكرة ، تعلم الشجاعة والمرونة والثبات. في السنوات ٢٠٠٠-٢٠٠١ اعترف بقوى الحزب. في عام ٢٠٠٨ ، جلب

ذكريات طفولته ومحيطه الثوري ، وعصيانه للحزب ، ومشاعره الثورية إلى أوروبا. شارك في الأنشطة. ذهب إلى الجمعيات والمعسكرات الحزبية. في عام ٢٠٠٩ ، في سن ١٦ ، أصبح عضوًا في منظمة الشبيبة الشيوعية (KKÖ).

أجرى أنشطة الشباب في ألمانيا ودورتموند وبوخوم وايسن ودويسبورغ. شارك في أعمال الأحمر أنتيفا. لقد خلق استشهاد الرفاق ياسمين ويلماز سلجوق في قلبه الرغبة في العمل في المجال السياسي والعسكري. كان يعتقد أنه لا يستطيع فعل ذلك بسبب مشكلة يده ، لذلك أبقى هذه الرغبة في قلبه. أصبح خلود الرفيق سركان توسون قوة النجاح في قلب الرفيق أوزكور ، وتحول جاذبية الرفيقة إيفانا هوفمان إلى قوة العمل بالنسبة له. بعزم كامل ، لجأ إلى مناطق حماية الدفاع المشروع من أجل حياة جديدة. في شتاء ٢٠١٦ ، تلقى تدريبًا أيديولوجيًا وسياسيًا وتنظيميًا وعسكريًا في أكاديمية حسين

ديميرجي أوغلو في جبال الحرية. في نفس العام ذهب إلى روج آفا للدفاع عن الثورة. لقد كان مقاتلًا محرّرًا ، واثقًا بالفعل ، وشجاعًا كان مختلفًا في قوته ، والآن أصبح مرشحًا للقيادة.

تنفس برائحة شنكال ومناطق حماية الدفاع المشروع. كعضو في قيادة أكاديمية شنكول بوران ، بذل جهودًا ناجحة لتطوير مقاتلين مليئين بمعرفة الحزب. لقد تقدم إلى الأمام كثوري من الأسفل إلى الأعلى بتصميمه وقوة الإبداع ومهاراته وعالمه. تولى المسؤولية الأمنية للقائد الشيوعي أحمد شورش اسم الحزب تولهلدان أكري. قام بواجبه بإحساس قوي بالمسؤولية ومعرفة بالواجب وإحساس بالرفاق. رفع الرفيق أوزان كوتلار ، الذي كان تلميذاً لقادة أقوياء مثل باران سرحد (بيرم نماز) وأحمد شورش (زكي كوربوز) عقد الرفيق أوزكور عضوية الحزب بشرف من ٢٠ أبريل ٢٠١٦ حتى نهاية حياته. قام بواجباته بشخصيته الواضحة ، والتضحية بالذات ، و الواجبات ، وقدرته على التعلم ، وعزمه على تغيير نفسه ، بشعور من الصداقة ورؤية قوية.

سنوسع ذكرته من خلال تطوير فرات الجديد (الأوزان) ، من خلال القتال تحت قيادتهم ، وأنشطتنا ضد الفاشية والإنكار والنظام الأبوي والرأسمالية والإمبريالية. سنقوم بواجباتنا الكاملة وواجباتنا الأممية بأربع أيادي. هذا هو وعدنا لشعبنا.

اللجنة المركزية لـ MLKP

Ehmed Şoreş
(Zeki Gürbüz)
Firat Newal
(Özgür Namoğlu)